گۆڤارا زانستێن مرۆڤایەتی یا زانكۆیا زاخۆ
مجلة العلوم الانسانية لجامعة زاخو
Humanities Journal of University of Zakho (HJUOZ)
*Vol. 5, No. 4, pp. 1252– 1259, December-2017*
journals.uoz.edu.krd
hjuoz.uoz.edu.krd
p-ISSN: 2410-7557
e-ISSN: 2518-5128

# ESTETÎKA HELBESTA KURDÎ YA NETEWEYÎ

Zülküf Ergün

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

***Wergirtin: 11. 2016 / Pesendkirn: 02. 2017 / Belavkirin: 06. 2017*** *https://doi.org/10.26436/2017.5.4.513*

**KURTÎYA LÊKOLÎNÊ:**
Çemka estetîkê di berhemên edebî de di çarçoveya form, naverok û binyada berhemên edebî de tê gengeşekirin û bi çendîn şêweyên cuda tê pênasekirin. Helbesta neteweyî ji ber ku li ser hizra hevgirtina civakî û siyasî ya îdeolojiya neteweyî tê danîn û ji forma xwe zêdetir bi naveroka xwe derdikeve pêş di çarçoveya hizrên estetîkî yên Hegel de dikare bê nirxandin. Lewra helbest wek cureya herî neteweyî ya edebiyatê ji bo bihêzkirin û belavkirina netewetiyê zemîneke gelek berhemdar e, ji ber vê jî helbestvanên kurd di serdema modern de naveroka helbesta nû bi netewetiya kurdî dadigirin û helbestê dikin zemîna hişyarkirina gel û pêşvebirina welat. Ev jî nîşan dide ku helbestvanên kurd ên neteweperwer poetîkaya xwe ya helbestê li ser bingeha estetîka Hegel ava dikin û ciwaniya helbestê di naveroka wê ya neteweyî de dibînin.
**KILÎLA LÊKOLÎNÊ:** Estetîka, Helbesta Kurdî, Helbesta Neteweyî.

## 1. Destpêk

Çemka estetîkê yek ji wan çemkên girift e ku di navbera boçûnên dijber de bi awayên cuda cuda hatiye pênasekirin û gelek caran di navbera çêjbexşîna bêhizir û nîşandan û xweşikkirina hizir û çemkeke diyarkirî de asê maye. Ji ber vê formalîst estetîkê wek zanista ciwaniyê pênase dikin, rexnegirên komelparêz wek zanista derbirîna hunerî ya heqîqetê û teoriya afirînerî ya hunerê didin zanîn, binyadger wê di çarçoveya tevahiyeke binyadî de berçav dikin û alîgirên estetîka wergirtinê estetîka berhema hunerî di nav têkiliya dualî ya xwîner û deqê de dinirxînin. Ji ber vê jî di çarçoveya armanca hunerê, hevgirtina naverok û ruxsarê yan jî têkiliya estetîk û heqîqetê de çendîn têgihîştinên dijber ên estetîkê derketine holê.
Têgihîştina yekem ji aliyê Immanuel Kant (1724-1804) ve tê temsîlkirin ku bi dîtina wî îdeaya estetîkî gelek caran hizir pîj bide jî xwe naspêre hizreke diyarkirî. Loma jî bi dîtina wî, ciwanî, wek objeyeke çêjwergirtinê bê çemk û hizir xwe nîşan dide. Ji ber vê jî hemû hewldanên ku ciwaniyê dikin amraza sûdeke siyasî, aborî û fêrkariyê red dike. Kant, objeyên estetîkî wek çêja bêtêkilî derdibire û wan wek mebestên bêarmanc li qelem dide (Zima, 2006: 22-23). Di têgihîştina estetîkî ya Kant de armanca ciwaniyê di nav wê de ye û ji bo xwe ye. Estetîk bê çemk û têgihîştin wek tiştekî tevahî û cêjbexş e. Loma jî nirxandina estetîkê cewhereke bi çand dixwaze û kesê ku nehatibe perwerdekirin nikare li ser estetîkê hukum bide (Hegel, 1994: 58). Bi vî awayî Kant nirxandin û têgihîştina berhemên hunerî bi çîneke diyarkirî ya xwendewar ve girê dide û tu roleke siyasî û civakî nade hunerê.
Li hember vê boçûnê, Georg Wilhelm Friedric Hegel (1770-1831) estetîkê awayekî taybet ê derbirîn û tesewirkirina heqîqetê pênase dike û berevajî boçûnên Kant bi dîtina wî estetîk ji serî heta dawî rê li ber hizirîna çemkî vedike (Hegel, 1994: 91). Ji ber vê jî huner li ser jiyaneke navxweyî, hestek, ruhek, naverokek û cewherekê tê avakirin û berhemeke hunerî ya ku çavkaniya xwe ji cewherekê wernegire wek berhemeke hunerî nikare bê pênasekirin (Hegel, 1994: 29). Hegel herçend naverok û ruxsarê wek du hêmanên estetîkê bi hev ve girê bide (Hegel, 1994: 20) û hevahengî û hevsengiya naverok û ruxsarê yan jî nîşander û nîşankirî pêwîst bizane jî, (Zima, 2006: 26) di çarçoveya peywendiya ruxsar û naverokê de sê qonaxên dîrokî destnîşan dike û diyar dike ku di serdema civakên berayî de ruxsar û naverok ji hev cuda ne û ruxsar di pêşiya naverokê de ye, di serdemên dêrîn û ronesansê de hevahengiya ruxsar û naverokê pêk tê û di dawiya serdema navîn û di destpêka serdema modern de jî di çarçoveya hunera romantîk de naverok dikeve pêşiya ruxsarê (Pospelov, 2014: 31). Bi vî awayî Hegel nîşan dide ku di serdema peydabûna netewetiyê de naverok dikeve pêşiya ruxsarê û ev di huner û edebiyata neteweyî de dibe diyardeyeke estetîkî.
Tzvetan Todorov (1939) wek rexnegirekî binyadger, van her du kateogoriyan wek du metirsiyên hevterîb dide zanîn û diyar dike ku eger berhemeke edebî tenê bi naverokê bê sînordarkirin wê demê dê xweseriya xwe ji dest bide û tu ciyawaziya wê ji deqeke felsefî nemîne; berevajî vê berhema edebî eger di çarçoveya ruxsar û nîşander de bê bertengkirin wê demê jî dê ciyawazî û arasteyên wê yên wateyî bên jinavbirin. Loma jî diyar dike ku ji bo destnîşankirina berhemeke edebî bi qasî pirsa “çawa”yê pirsa “çi”yê jî girîng e. Ji ber vê jî Todorov li derveyî kategoriyên naverok û ruxsarê yan jî hevsengiya naverok û ruxsarê, berhema edebî wek binyadek, tevahiyek û yekeyeke livîner destnîşan dike û duberekiya naverok û ruxsarê red dike (Todorov, 2012: 95-96).
Rita Felski jî li ser rêbaza estetîka wergirtinê û fenomenolojiya nû hem li dijî hizra tekanebûna berhema hunerî ya kantparêz hem jî li dijî rexneya îdeolojîk a hegelparêz derdikeve û diyar dike ku edebiyat ne ji tora peywendiyên dewrûber dikare bê dabirîn, ne jî divê di navenda civak û siyasetê de wek semptomeke binyada civakî û dozeke siyasî bê nirxandin (Felski, 2010: 15). Bi raya wê nirxa estetîkî ji têgihîştina sûdê nikare bê ciyakirin, lê ev sûd ne di wateya îdeolojiyeke diyarkirî û armanceke stratejîk de ye, belkî di navenda vê sûdê de xwînerên azad hene ku her yek ji wan bi awayekî û ji bo armanceke cuda têkilî bi berhema edebî re datîne. Ji ber vê ji binyadgeran cudatir zûrbûna li ser berhemê red dike û pêvajoya xwendinê peywendiyeke dualî dibîne ku hem deq karîgerî li ser xwêner çê dike hem jî xwîner xwe tevî deqê dike (Felski, 2010: 11). Bi vî awayî Felski digel deqa edebî xwîner jî dike çavkaniya afirandinê û ciwaniyê di nav vê peywendiyê de dibîne.
Di encama van nîqaşan de mirov dikare bibêje ku helbesta neteweyî bi pêgîriya xwe ya siyasî û civakî li ser rêçika estetîka Hegel e û taybetiyên giştî yên teoriyên huner bo civakê di nav xwe de dihewîne. Ji ber vê jî di vê gotarê de em dê pêşî bingeha hizrî ya estetîka helbesta neteweyî vekolin û paşê jî di mînaka Ehmedê Xanî, Hacî Qadirê Koyî, Qazî Letîf, M. Nûrî / Elî Kemal, Ehmed Muxtar Caf, Şêx Nûrî Şêx Salih, Qani‘, Esîrî, Zêwer, Cegerxwîn, Qedrî Can û Hêmin de em dê li ser taybetiyên poetîkaya helbesta neteweyî ya kurdî rawestin û

têgihîştina helbesta neteweyî ya helbestvanên navborî destnîşan bikin.

### 2. Bingeha Hizrî ya Estetîka Helbesta Neteweyî

Estetîka helbesta neteweyî di çarçoveya rêbaza huner bo civakê de li ser tevahiya îdeolojiyeke diyarkirî peyda dibe. Lewra netewetî çawa ku li hember parçebûna civaka dînî û feodal wek alternatîfa hevgirtineke nû derdikeve holê, helbesta neteweyî jî bang li endamên neteweyê dike ku di çarçoveya hizra neteweyî de hev bigirin û bi damezirandina dewleta neteweyî qadên çandî û siyasî li hev bînin û bikin yek. Ji ber vê, estetîka helbesta neteweyî li ser rêçika estetîka Hegel xwe dispêre têgihiştineke tevahî û giştgîr a cîhaneke pênasekirî. Di vê estetîkê de hevahengiya navxweyî ya siyasî û îdeolojiya yekgirtî ya civakî hokarên sereke yên peydabûna berhemên hunerî ne. Bi dîtina Hegel ev diyarde yekem car di serdema bajarên yûnanî de pêk hatiye û ji ber wê jî di vê serdemê de berhemên hunerî yên serkeftî hatine berhemanîn (Zima, 2006: 26). Ev nîşan dide ku estetîka Hegel a ku bingeha hizrî ya estetîka helbesta neteweyî datîne, ji aliyê sosyolojîk û siyasî ve di wan serdeman de derdikeve pêş ku cîhan di çarçoveya îdeolojiyeke yekgirtî de tê pênasekirin û huner û edebiyat jî wek deravêteya vê îdeolojiya yekgirtî tên afirandin. Ji ber vê reh û rîşeyên vê estetîkê digihîje serdemên kevintir û ji destpêka rexneya edebî ve di bin nav û nîşanên ciyawaz de hin taybetmendiyên wê derketine holê.

Platon wek yekem rexnegirê edebî, diyar dike ku helbestvan divê piştevan û parêzerê welatê xwe be û bi helbestên xwe pesnê wan kesan bide ku bajarên yûnanî bi saya wan pêş ketine. Li gor wî eger helbestvanek vî erkê xwe bi cih neyîne divê ji bajêr bê derkirin (Bressler, 2002: 41), lewra helbestên ku di vê çarçoveyê de nebin dê xizmeta yekgirtina civakî û siyasî nekin. Aristoteles jî wek teorîseyekî vê serdemê, di çarçoveya vê hevgirtinê de di *Peotîka*ya xwe de berê helbestê dide lasayîkirina teşeyan û diyar dike ku divê helbestvan yan tiştên bûyî yan tiştên ku niha dibin yan jî tiştên ku hebûna wan tê ragihandin lasayî bike û jiyanê bike çavkaniya helbesta xwe (Aristoteles, 2014: 77). Quintus Horatius Flaccus jî di *Ars Poetîka*ya xwe de diyar dike ku divê helbestvan zanyariyê bike çavkaniya hunera xwe û tiştên ku ji bo welat pêwîst in, dilovaniya li hember bav, girîngiya dostaniyê, çawaniya reftarên li hember bira û mêvanan, erkê senator û dadweran û erkê fermandarê ku ji bo cengê hatiye şandin yek bi yek bizane û di helbesta xwe de diyar bike. Loma jî bi dîtina wî helbest divê hem sûdbexş be, hem jî çêjbexş be (Flaccus, 2012: 35) û bi vî awayî hevgirtina hunerî û heqîqetê biparêze.

Terry Eagleton di çarçoveya boçûnên Aristoteles û Horatius de di wê serdemê de helbestê wek binbeşeke retorîkê di navenda jiyana siyasî û civakî de bi cih dike û diyar dike ku di wê serdemê de retorîk hem xwedan wateyeke deqî ye, hem jî xwedan wateyeke siyasî ye. Lewra retorîk wek teoriyeke vegêranê; ji dezgehên siyasî, huquqî û dînî yên dewletên dêrîn nayê veqetandin û ji pevgihîştina gotar û desthilatê peyda dibe. Bi vî awayî li gor wî hunera retorîkê ne tenê çekekî karîger e di destê împaratoran de, di heman demê de ‘elametê ciyaker ê mirovê azad e ji bendeyan (Eagleton, 2011: 16-17). Nexwe helbest di wê serdemê de xwedan hêzeke siyasî û civakî ye ku di destê hukumdaran de dikare bibe amrazeke arastekirinê û di destê mirovên sade de jî bibe mertalê bergirî û parastinê.

Bi hilweşîna sîstema civakî û siyasî ya bajarên yûnanî re bingeha hevgirtina estetîkî ji holê radibe, lê piştî dabiraneke dirêj, bi saya kilîseyên xirîstiyaniyê û metafîzîk û îdeolojiya wê ya civakî û siyasî cîhan careke din wek bazineyeke yekgirtî tê pênasekirin (Lukacs, 2011: 47) û bingeha hevgirtina estetetîkî dubare tê dabînkirin. Ji ber vê xirîstiyanî dibe cewhera hunera serdema navîn a Ewrûpayê û ji ber vê fonksiyona xwe jî rehên xwe berdide kûrahiya ruhê civaka ewrûpayî (Karatani, 2011: 100). Philip Sidney (1554-1586) wek rexnegirê edebî yê vê serdemê, bi armanca dariştina bingeha hevgirtina estetîkî, boçûnên Aristoteles di sefoka xirîstiyaniyê re derbas dike û wan jinûve şîrove dike. Ji ber ku di têgihîştina ruhê mirov de karîgeriyeke mezin a honraweyê (nezm) heye, Sidney honraweyê ji bo hemû şaxên huner û zanistê amraza herî karîger li qelem dide. Bi dîtina wî, helbestvan wek zanyar û dîrokvanan ne tenê lasayiya siruştê dikin, di heman demê de bi rêya hêza xeyalê rehendên îdeal ên ruh û hebûnê jî nîşan didin. Di vê çarçoveyê de helbestvan hem siruştê raçav dikin hem jî rastiya îdeal û çemkî dibînin û vêya di zemîna hunerî de berceste dikin. Loma jî bi raya wî helbest, ji hemû huner û zanistan zêdetir heqîqetê derdibirin (Bressler, 2002: 55). Sidney wek taybetiya vê serdemê destnîşan dike ku erkê helbestvanan ew e ku nîzama îlahî ya neguher di dem û cih de rêkbixin, di nav vê jiyana guherbar de armanca sereke ya mirovan nîşan bidin û vê bikin mijara hunera xwe. Ji ber vê, naveroka berhema hunerî ji ruxsara wê girîngtir dibîne û ji bo gihîştina van armancan diyar dike ku divê zimanekî sade û vekirî yê helbestê hebe (Kantarcıoğlu, 2009: 51-54).

Di dawiya serdema navîn û ronesansê de, bi peydabûna hin hizrên nû di pênasekirina cîhanê de ji bilî eqil hemû otorîte tên redkirin û eqil di avakirina pergala cîhanê de wek afirînerê tekane bi hukumraniyeke bêsînor êrîş dibe ser teolojiyê û bi hemû hêza xwe hewla jinavbirina wê dide. Dijayetiya teolojî, kilîse û dogmayê vediguhere ser dijayetiya dîn (Ewald, 2013: 10) û bi vî awayî cîhana yekgirtî ya ku xwe dispêre metafîzîka xirîstiyaniyê di serdema modern de careke din dikeve ber êrîşa hilweşandinê û bi serdema şoreşan re estetîka cîhana xirîstiyaniyê serûbin dibe. Di vê serdemê de li hember estetîka cîhana berfireh a pênasekirî ya watedar a dîn û baweriyên îlahî, estetîka cîhaneke biçûk a destkird a beşerî tê avakirin, lewra di şûna Xwedayekî bivîn û bihêz de ruhekî daîmonîk hukumferma dibe û hevgirtina wateyî ya berê hildiweşe (Lukacs, 2011: 92). Loma jî ji bo pêkanîna hevgirtineke nû di şûna vîn û daxwazên xwedayî de delîlên eqlî û zanistî tên binecihkirin û bingeha estetîkeke sekuler a “zanistî” tê danîn. Bi vî awayî ji serdema ronesansê û vir ve têgihîştina estetîkê ji heqîqeta kemalxwaz a xeybî hêdî hêdî berê xwe dide heqîqeta kemalxwaz a zemînî (Plîxanof, 2005: 35).

Ji ber vê guherînê di serdema ronakgeriyê de regezên sereke yên boçûna cîhana nû objektîfî û entelektuelîzm in û bi gotina Georgi V. Plehanov estetîka eqlî û zanistî ya vê serdemê li dijî kategoriyên nemir û îdealîzma subjektîf derdikeve holê (Plehanov, 1999: 15). Di vê çarçoveyê de siruşt ji mebestdariyê tê dabirîn û li gor prensîba sedemê tê şîrovekirin. Bi vî awayî her tişt ji bo têgihîştina niha, jinûve tê pênasekirin. Êdî armanc tên wê watayê ku mirov paşerojê bîne îro, hêz ew tiştê borî ye ku karîgerî li ser niha çê dike û cewher jî kartêkirina borî û paşerojê ye ku bi saya nihayeke aram peyda dibe. Ji bo fermanrewayiya cîhaneke weha jî divê mirov bi rêya hişmendiyê wate bi rêya bikeriyê (Ewald, 2013: 10) her tiştî bi eqil, hêz û vîna xwe ve girê bide.

Li hember vê hişkiya eqlî ya ronakgeran, romantîzm wek qeyrana ruhî ya serdema nû, çareseriyê di vegeryana siruştê û kûrkirina xewn û xeyalan û xemilandina îdealên serdema navîn de dibîne. Lewra berê mirov bi Xweda re diaxiftin, lê piştî ku di serdema ronakgeriyê de peywendiya mirovan bi Xweda re tê birîn romantîk ji neçarî xwe dispêrin siruştê û bi xewn û xeyal û nostaljiyê valahiya xwe ya manewî dadigirin. Ji ber vê Eagleton diyar dike ku romantîzm li hember zîhniyeta ronakgeriyê xwe li helbestiyetê digire û bi rêya helbestê rexne li jiyana gelemper digire (Eagleton, 2011: 19-22).

Di vê rewşê de Rousseau xişteya eqlî ya sar a ronakgeriyê dişikîne û bi têkelkirina hişmendiya ronakgeriyê û germahiya romantîzmê di çarçoveya hizra neteweyî de cîhaneke zindî, hestpêker û germ datîne şûna wê (Ewald, 2013: 164). Ji ber vê Rousseau li hember zanist û hunera reha ya ronakgeran erkekî exlaqî û neteweyî dispêre zanist û hunerê û diyar dike ku divê armanca zanist û hunerê bilindkirin û pêşvebirina gel be. Li gor wî nabe ku welatek xwedan zanyar, helbestvan, muzîkjen û şêwekarên baş be, lê welatiyên wê bêrûmet bin û bi xizanî û

perîşanî bijîn. Rousseau di wê baweriyê de ye ku heta “gotina xweş a welat” li ber guhên zarok û ciwanên welat nekeve û zanist û huner xwe nespêrin exlaq, dê çewtî ji rastiyê neyê cudakirin û wateya merdîtî, heqnasî, fedakarî, mirovî, qehremaniyê di hişê welatiyan de cihê xwe negire (Rousseau, 2011: 26-29). Bi vî awayî Rousseau hizra neteweyî wek bingeha estetîkê derdixe pêş û bi vê helwesta xwe careke din di navbera huner û civakê de peywendiyeke bihêz saz dike.

Netewetî wek bizaveke modern, li hember parçebûna jiyana modern bi rêya dîrok, çand, ziman û dewleta neteweyî, careke din hewla rêkxistina jiyanê dide û bi dagirtina valahiya xirîstiyaniyê wek dînekî sekuler dibe kana hevgirtina civakî û estetîkî. Lewra netewetî li ser şopa dînên berê hesta berdewamiyê dide endamên xwe û baweriyeke weha li cem wan çê dike ku herwekî netewe ji dîrokeke ezelî hatiye û berê xwe dide paşerojeke bêdawî (Anderson, 2011: 24-25). Bi gotina Smith netewetî herçend wek îdeolojiyeke sekuler serî hildabe jî bi îdealîzekirina romantîkên neteweyî wek wekîlê dîn dibe hilgirê taybetiyên civaka etno dînî ya berî moderniyê (Smith, 2012: 81) û di nav parçebûna serdema modern de hesta tevahî û berdewamiyê dibexşîne mirovan. Bi vî awayî îdeolojiya netewetiyê hesta tevahî û berdewamiya raboriyê jinûve diafirîne û wê valahiyê dadigire ku di navbera takekes û civakê de çê bûye (Eriksen, 2002: 160).

Netewetî, ji bo bihêzkirina hevgirtina civakî û dabînkirina berjewendiyên neteweyê raborî, îro û paşerojê bi hev ve girê dide. Loma jî her neteweyek di dîrokê de ji xwe re serdemeke zêrîn peyda dike û wê dike serçaviya xwe ya manewî. Di nav vê dîrokê de mînakên weha tên hilbijartin ku wate dibexşin îro û paşerojê. Ji ber vê kesayetên qehreman û serdemên zêrîn wek sembolên manewî yên neteweyê tên afirandin. Di vê çarçoveyê de ji ber ku dîrok dibe kana moral a îroya neteweyê hunermendên neteweyî dema bi nifşên îro re diaxivin dîroka neteweyî wek ayetên pirtûkên pîroz bi kar tînin û di nav vê forma pîroz de dema niha û erkên endamên neteweyê pênase dikin. Helbet rewşa nebaş a neteweyê û fişarên neteweyên derdorê jî dibin palpişt da ku endamên neteweyê xwe di hevgirtina neteweyî de bibînin û hebûn û xweşbextiya xwe di çarçoveya neteweyî de misoger bikin. Bi vî awayî di navbera raborî, îro û paşerojê de hevdemiyek tê sazkirin û tevahiyeke wateyî tê çêkirin.

Anderson, hevgirtina neteweyî û xeyalên hevbeş ên civakî bi teknolojiya çap û belavkirinê û bi rojname, roman û berhemên edebî ve girê dide û bi awayekî nerasterast be jî edebiyata neteweyî wek pêkhînerê sereke yê hevgirtina xeyalên neteweyî destnîşan dike. Bi dîtina wî di çêkirina xeyala civakên dînî de rola hecê çi be di çêkirina xeyala civakên neteweyî de jî rola çapxaneyê ew e. Lewra çawa ku bi saya hêza sembolîzma hecê, Roma ji bo xirîstiyanan, Mekke ji bo muslumanan û Benares jî ji bo hînduyan dibe cihê lihevrasthatina bawermendan û berfirehkirin û bihêzkirina xeyala civaka dînî (Anderson, 2011: 70-71), di rojname û berhemên edebî de jî endamên neteweyê dibin hevbeşê xema kesên ku qet nedîtine û bi wan kesên dûr û xeyalî re peywendiyeke rûhî datînin. Çapemenî di vir de di şûna hecê de rola lihevrasthatina kesayetên neteweyî dibîne û zimanê neteweyî jî dibe xala pevgirêdana van kesan (Anderson, 2011: 50). Lewra bi kodkirin û standartkirina zimanên neteweyî û bi afirandina remzên nû yên neteweyî re, hem kêşeya tênegihîştina endamên neteweyê tê çareserkirin, hem jî bi standartkirina zimanên Ewrûpayê re hizra dêrînbûnê li cem mirovan peyda dibe (Anderson, 2011: 60). Bi saya vê, endamên civakên neteweyî, xwe wek mîratgirê dîrokeke dûrûdirêj qebûl dikin û hewl didin xwe bi rêya dîrokê kevintir û resentir nîşan bidin. Çapemenî yan jî edebiyata neteweyî jî wek pêkhînerê vê bîra hevbeş, sînorê dem û cihên ciyawaz radikin û dibin hevîrtirşê bîra neteweyî.

Ji ber vê ye ku di çêkirin û hevgirtina xeyalên neteweyî de nivîskar û helbestvan wek afirînerê edebiyata neteweyî di navenda jiyana civakî û siyasî de cihê xwe digirin û bi rola xwe ya çalak a siyasî û edebî di danîna bingeha bihêzkirin û bilindkirina neteweyê de pêşengî dikin. Loma jî helbestvan û nivîskarên neteweyî bi têkelkirina her du nasnameyên xwe yên siyasî û edebî wek kesayetên çekbidest û qelembidest beşdarî têkoşînên siyasî dibin û hûnera xwe dixin bin xizmeta azadkirin û bilindkirina gel û welatê xwe.

Peyrewên edebiyata neteweyî ji ber vê helwesta xwe gelek caran pêgîrê armanc û gotara rêxistin û dezgehên neteweyî dibin û di çarçoveya siyaseta wan de naveroka berhemên xwe dadigirin. Ji ber vê çendê gelek caran naveroka siyasî û civakî ya berheman vediguhere propagandayê û ev berhem wek çekekî tên bikaranîn. Di mînaka her du cengên cîhanê yên mezin de tê dîtin ku berhemên edebî wek amrazên cengê tên bikaranîn û di çarçoveya siyaseta neteweyî de tên afirandin. Di vê çarçoveyê de weşan û belavkirina van berheman ji aliyê dewletên neteweyî ve tên fînansekirin û di dema cengê de berhemên edebî ji bo bihêzkirina manewiyata serbazan yan jî ji bo şikandina manewiyata dijmin tên nivîsîn û bi vî awayî dibin amrazeke arestekirina girseyên mirovan (Köroğlu, 2004: 39).

Ji ber vê peywendiya bihêz a edebiyata neteweyî û siyasetê wek encameke siruştî estetîka formê gelek caran li dû naverokê dimîne û endîşeyên siyasî dikevin pêşiya endîşeyên estetîka ruxsarî. Ronakbîrê Kenyayî Ngugi Wa Thiong vê rewşê gelek asayî dibîne û di mînaka Efrîqayê de bal dikêşe ser vê taybetiya edebiyata neteweyî ku bi dîtina wî “tu wateya huner ji bo hunerê nîne û rewşa ku Efrîqa tê de ye derbarê edebiyatê de ji têgihîştina estetîkeke ruxsarî zêdetir têgihîştineke siyasî ferz dike” (Jusdanis, 1998: 26). Wê demê edebiyata neteweyî gelek caran ji endîşeyên ruxsarî yan jî ji hevahengiya ruxsar û naverokê derdikeve û naverok dikeve pêşiya ruxsarê.

Avner Ziss, ji bilî encama siruştî ya peyamdariya berhemên edebiyata neteweyî, hevnegirtina ruxsar û naveroka berhemên edebî bi diyalektîka peresendina wan her du pêkhateyan ve jî girê dide û bi dîtina wî di yekîtiya naverok û ruxsarê de, naverok livînertir e û ji ruxsarê bileztir geşedistîne (Ziss, 1984: 120). Loma jî ruxsar di encama xebatên demdirêj û hûr û kûr de dikare xwe li bejna naveroka nû bifesilîne û ji bo teşegirtina wê demeke firehtir pêwîst dike. Lewra hunermendên neteweyî li pey lezûbeza armancên siyasî û civakî gelek caran xem û xeyal û bîrokeyên nû li ser pişta bêje û tabîr û qalibên kevin siwar dikin û ji bo peydakirina ruxsareke nû ew çend dema wan nîne. Hunermendên neteweyî di nav gerînekên jiyana nû de gelek caran di nav şer û serhildanên xwînavî de îlhama xwe ji pêşhatên jiyanê werdigirin, loma jî berê xwe didin formên herî populer ku ji bo xelkê çavnas in û xelk bi hêsayî ji wan têdigihîje.

### 3. Helbest Wek Cureya Herî Neteweyî ya Edebiyatê

Di nav cureyên edebî de helbest kevintirîn cure ye ku peywendiyeke bihêz digel mirovan heye û hema bibêje dîroka wê bi qasî dîroka mirovahiyê dûvdirêj û dêrîn e. Ji ber vê Johann Gottfried Herder (1744-1803) diyar dike ku regezên helbestê di zimanên berayî de jî tên dîtin û bi vê diyardeyê bi tingîn û tevger û livîna mirovan û bi lasayîkirina siruştê ve girê dide (Herder, 2006: 29). Her li ser vê rêçê Jean Jacques Rousseau, di zimanên pêşî de di çarçoveya hebûna mecaz û ciwankariyan de diyar dike ku mirovan pêşî bi awayekî helbestî axiftine (Rousseau, 2009: 11) û helbest bi axaftinê re derketiye holê. George Thomson jî di heman çarçoveyê de diyar dike ku zimanê helbestî yê birîtm ê ku di merasîman de hatiye bikaranîn bingeha xwe ji dengê kar ê serdema pêşî wergirtiye (Thomson, 1991: 185-186) û bi vî awayî dîroka peydabûna helbestê vedigerîne destpêka axaftina mirovan.

Diyar e, helbest bi taybetmendiyên xwe yên rîtm û kêşê berî ku wek cureyeke edebî derkeve holê di nav hemû gelên cîhanê de wek çalakiyeke hevbeş a jiyanê bûye yek ji çalakiyên estetîkî yên herî kevin ê eqlê mirov ku di hemû warên jiyana civakî de rengvedanên wê çê bûne, heta bi gotina Nietzsche mirovên pêşî ji bo ku kar li ser xwedawendan bikin duayên

xwe jî di forma helbestê de xwendine (Nietzsche, 2011: 83). Bi vî awayî di nav pêvajoyeke dûrûdirêj de helbest bûye hilgirê gelek diyardeyên civakî û ji bilî çêjeke estetîkî wek regezeke girîng a jiyana civakî û amraza hevbeş a eqlê kolektîf rol gêraye. Ji vî aliyî ve helbest di serî de ji derbirîna hestên takekesî zêdetir wek awêneya çalakiyên civakî û derbirê xem û daxwazên komeke diyarkirî derketiye pêş. Lewra bi gotina Christopher Caudwell helbest ji aliyê taybetmendiyên xwe ve wek stranê ye û musaîdî vegêraneke bicoş a kolektîf e. Loma jî di serdemên kevin de digel têkeliya govend û muzîkê enerjiya navxweyî ya mirovan livandiye, berê wan daye karên hevbeş û wek temsîla vê çalakiyê hatiye dahênan. Ji ber vê jî bi gotina wî, heqîqeta helbestê ne di derbirînên wê yên razber de ye; belkî di rola wê ya çalak a civakî û coşa wê ya navxweyî de ye (Caudwell, 1988: 21-41) ku li ser destê helbestvanekî diyarkirî ev cîhana coşên hevbeş bi kesên din re tê parvekirin û helbest vediguhere çalakî û rîtueleke civakî.

Ji ber vê têkiliya dêrîn a helbestê û mirovan, li gor Eliot, helbest şaxa herî neteweyî ya hunerê ye. Bi dîtina wî, di helbestê de regeza sereke hest e û helbest bi hilgirtina nirx û taybetmendiyên neteweya xwe ji hemû şaxên hunerê yên din cuda dibe. Lewra neteweyek dikare mîna neteweyeke din bifikire, lê zehmet e ku mîna neteweyeke din hest bike. Dema civakek mîna civakeke din hest bike, êdî nasnameya xwe ya berê winda dike û vediguhere tiştekî din (Eliot, 2007: 185). Dema weha be, hizra neteweyî, bi armanca çêkirina nasnameya neteweyî û destnîşankirina cudatiyên neteweyeke diyarkirî ji neteweyên dîtir, herî zêde dikare bi rêya helbestê xwe berceste bike. Lewra helbest wek warê kodkirina hestên neteweyî hem dikare peywendiyeke ruhî bi dîroka bavûkalan re çê bike, hem jî dikare ji bo gihîştina armancên paşerojê bibe çavkaniya çêkirina hest û sozên hevbeş ên neteweyî. Ji ber vê Fichte diyar dike ku “perwerdeya ruhî ya gelê alman divê bi rêya helbestê bê kirin û zimanê helbestê jî divê bi ruhê almanî mişt be” (Ökten, 2006: 417).

Ji bilî taybetmendiyên xwe yên navxweyî helbest bi taybetmendiyên xwe yên ruxsarî jî ji bo derbirîn û nûnertiya hizra neteweyî cureyeke guncaw e. Lewra helbest ji cureyên din cudatir bi taybetmendiya binyadî ya vegêrana xwe ya navendî û monolojîk (Brandist, 2011: 179) rê li ber gotareke serdest a vegêrekî bêreqîb vedike ku dengê wî li ser hemû dengên dîtir zal be. Ev ji bo cihbicihkirina armancên neteweyî derfeteke zêrîn pêşkêşî helbestvan dike ku bi vê rêkê helbestê bike zemîna bangeşeya îdeolojiya neteweyî. Loma jî binyada vegêrana helbestê ji bo helbestvan dibe mînbereke bilind a bangeşeyê ku li ser vê mînberê bi asanî bikare gotareke neteweyî çê bike û bi dengekî bilind wê pêşkêşî endamên neteweyê bike.

Li aliyê din helbest ji aliyê dîrokî ve jî wek cureya sereke ya geşedana zimanên neteweyî derdikeve pêş û dibe yek ji çavkaniyên girîng ên çêkirina hizra neteweyî. Lewra Dante (1265-1321) hêja berî peydabûna hizra neteweyî di serdemeke zûtir de di şûna zimanê latînî de bangeşeya zimanê îtalî dike û bi vî awayî nerîta nivîsîna berhemên edebî bi zimanên neteweyî dide destpêkirin. (Nesrîn Raûf Îsmaîl, 2010: 17). Lewra zimanên klasîk ên dînên mezin bi gotina Anderson ji bo neteweyên ciyawaz rêya gihîştina heqîqetên îlahî bû (Anderson, 2011: 51) û xizmeta xeyala civaka dînî dikir, lê zimanê neteweyî bi kodên xwe yên civakî û neteweyî arasteya mirovan diguherand û ev dibû sedem ku xwînerê zimanê neteweyî bi şêweyekî din bifikire û xeyal bike. Kodkirina zimanên neteweyî ji ber ku pêşî bi rêya helbestê pêk tê, helbest ji vî aliyî ve dibe zemîna avakirina tesewira netewetiyê û wasiteya belavkirina hişmendiya neteweyî. Loma jî helbest yekem cureya çêkirina fantaziya neteweyî ye û di vî warî de ji hemû cureyên din xwedan ezmûntir e.

Weha xuya ye ku helbest di nav cureyên edebî de bi taybetiya xwe ya binyadî û têkelkirina hest û hizran ji bo derbirîna îdeolojiya neteweyî cureya herî guncaw e. Herwekî ku Eliot jî dibêje helbest çalakiya mejiyekî weha ye ku tê de hest û raman bi hev re tên strandin (Eliot, 2007: 10). Ji ber vê jî di helbesta neteweyî de hişmendiyeke neteweyî ya bihêz peyda dibe. Ji vî aliyî ve jî helbesta neteweyî, ne bêserûberiya hestên takekesî ye, di bin rêberiya hişmendiyeke siyasî de livandin û arastekirina hestên komelî ye û diyarkirina xemeke kolektîf e ku xwe di kirasê hestên helbestvanekî diyarkirî de nîşan dide. Ji ber vê jî helbesta neteweyî herçend wek şaxeke edebiyata neteweyî ji zemîneke realîst serî hilde jî, ji bo gihîştina armancên neteweyî gelek caran taybetiyên hestiyariya romantîk hildigire û rastiya jiyanê ne tenê rasterast û wek xwe nîşan dide, forma wê ya îdeal jî destnîşan dike û dibe warê dahênana hest, hizir û kesayetên neteweyî. Kojin Karatani di vê çarçoveyê de dijberiya realîzm û romantîzmê tiştekî bêwate dizane û diyar dike ku helbesta neteweyî wek beşek ji edebiyata modern carinan bi aliyê xwe yê realîst û carinan jî bi aliyê xwe yê romantîk derdikeve holê (Karatani, 2011: 45). Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin ku helbesta neteweyî di navbera realîzm û romantîzmê de têkeliyeke bihêz çê dike ku mirov dikare jê re bibêje realîzma îdealî yan jî romantîzma şoreşgêrî.

Li ser vê bingehê mirov dikare bibêje ku helbesta neteweyî li ser eqlekî modern ê realîst û li ser hestekî arastekirî yê romantîk tê avakirin. Hesta helbestê ji ber ku derbirîna egoya civakî ye, helbestvan di nav xem û azarên îro û serkeftin û serweriyên dahatûyê de areste dide civakê û bi palpiştiya şiyana cemawerî helbestê dike rêbaza gihîştina armancên neteweyî. Eger em bi gotina Sartre bibêjin helbest dibe şêweyekî xwestina azadiyê (Sartre, 2011: 70) û eger ev bi qelemê bi dest neyê, helbestvanê neteweperwer amade ye qelemê dayne û dest bavêje çek. Loma jî di her halûkarî de helbesta neteweyî berê cemawarê dide qada pevçûnê û helbestvan di cenga rizgariya neteweyî de bi peyvên xwe dicenge û hêz dide cengawerên çekbidest. Ji ber vê ye ku di Cenga Cîhanê ya Duyem de firokeyên Sondxwaran helbestên Paul Eluard (1895-1952) bi ser frensiyan de belav dikin, da ku ev helbest şiyana berxwedana frensiyan li dijî Naziyan zêde bikin (Ebdulla Yasîn Amêdî, 2005: 15). Ev jî nişan dide ku helbesta neteweyî di çarçoveya armancên stratejîk ên eqlî yên neteweyekê de hewl dide hest û dilovaniya endamên neteweyê bilivîne û bibe çirûska hişyarkirina şiyana gelekî bo armancên neteweyî.

## 4. Poetîkaya Helbestvanên Kurd ên Neteweperwer

Helbest wek cureya herî dêrîn a edebiyatê, di dîroka xwe ya dûrûdirêj de di çarçoveya pêşhatên civakî û siyasî de reng û rûyên taybet werdigire û di her serdemekê de di bin karîgeriya mercên taybet de di naverok û ruxsara wê de guherîn çê dibin. Bêguman helbesta neteweyî berhema serdema modern û netewetiyê ye û di bin karîgeriya van her du diyardeyan de teşe digire. Digel vê yekê, ji nav hokarên diyarker ên helbesta neteweyî hinek jê vedigerin serdemên zûtir û berî destpêka netewetiyê ku mirov dikare wan wek sedemên derketina netewetiyê destnîşan bike. Hişmendiya bikaranîna zimanê neteweyî yek ji van hokaran e ku li hember zimanên navendî yên împaratoriyên serdema navîn tê binecihkirin.

Di vê çarçoveyê de eger Danteyê îtalî û Shakespeareê îngilîzî bi nivîsîna zimanê neteweyî bingeha edebiyata neteweya xwe danîbin, Ehmedê Xanî jî di edebiyata kurdî de bi nivîsîna *Mem û Zîna* xwe yekem car di navbera helbest û nasnameya etnîk de peywendiyeke bihêz datîne û berê helbestê dide mijarên civakî û siyasî. Herçend berî wî kurdî di warê edebiyatê de hatibe bikaranîn jî tu kesî wek wî di navbera helbest û zimanê neteweyî de têkiliyeke ontolojîk dananiye. Lewra Xanî diyar dike ku wî bi armanca bilindkirina zimanê kurdî dest avêtiye qelemê û dema dibêje “Hasil, ji înad, eger ji bêdad / Ev bîd‘ete kir xîlafê mu’tad” behsa vê yekê dike. Herweha dema dibêje: “Safî şemirand, vexwarî durdî /Manendê durê lîsanê Kurdî / Înaye nîzam û întîzamê / Kêşaye cefa ji boyê amê / Da xelqi nebêjitin ku Ekrad / Bême’rîfet in, bêesl û binyad” (Xanî,

2005: 170) diyar dike ku zimanê kurdî li ser destê wî bi awayekî rêkûpêk bûye zimanekî edebî û bikaranîna wê di warê edebî de jî merîfet û esalet bexşiye neteweya wî. Bi vî awayî Xanî di dîroka helbesta kurdî de bingeha helbesta peyamdar datîne û bi vê poetîkaya xwe di serdema modern de îlham dide gelek helbestvanên kurd ku di çarçoveya rêbaza huner bo civakê de kar dikin.

Bêguman belavbûna hizra neteweyî di nav cîhana îslamî de di nîvê duyem ê sedsala nozdehan de dest pê dike û di edebiyata kurdî de jî ev diyarde yekem car di helbestên Hacî Qadirê Koyî de tê dîtin. Hacî wek helbestvanekî nerîtşikên helbesta xwe ji helbesta klasîk vediqetîne û di serdema modern de dibe pêşengê poetîkaya helbesta neteweyî. Loma jî li ser têkelkirina helbesta xwe û helbesta Nalî diyar dike ku kesên ku helbesta Nalî û helbesta wî tevlihev dikin "ehmeqên sûretperest û cahîlên me'na nezan in", lewra bi dîtina wî ew bilbilê nûbiharê ye, lê Nalî bilbilê payîzê ye (Hacî Qadirê Koyî, 2707: 223). Diyar e, Hacî guherîna naveroka helbestê wek nûbûnekê dibîne û bi metafora "bilbilê nûbiharê" xwe wek pêşengê helbesta nû ya neteweyî nîşan dide. Bi dîtina wî, di helbestê de êdî behsa "zulfên dirêj û çavên bi xew" bi kêr nayê û ev tişt di ber bayê serdemê de bûne serab (Hacî Qadirê Koyî, 2707: 197). Lewra helbestên ku li ser pesindana bade û dilberê yan jî li ser handana işqbazî û derwêşiyê hatine nivîsîn bûne sedema paşvemana xelkê û eger di şûna wan de helbestên wî yên neteweyî bihatana xwendin û jiberkirin dê milet biketana rewşeke pêşketîtir û baştir. (Hacî Qadirê Koyî, 2707: 167-168) Hacî di mînaka helbesta xwe de helbesta neteweyî wek amraza gihîştina rizgarî û azadiyê dibîne, ji ber vê diyar dike ku heta kurd qedrê beytên wî negirin dê di bin barê romiyan de bimînin. Lê digel guhnedana kurdan Hacî bi rêya helbestê di hişyarkirina kurdan de îsrar dike û weha dide nîşandan ku ev doz jê re bûye"'îlletî sewda" (Hacî Qadirê Koyî, 2707: 169). Loma jî helbestên xwe bi hêviya razîkirina xelkê dişîne welat (Hacî Qadirê Koyî, 2707: 86) û dixwaze civaka kurdî bi van helbestan hişyar bike. Bi vî awayî Hacî sînorên navbera edebiyat û civakê radike û poetîkaya helbesta kurdî ya neteweyî di sedsala nozdehan de destnîşan dike.

Di seranserî sedsala bîstî de ji ber guherînên bingehîn ên herêmê û serhildanên berdewam ên kurdan, helbesta kurdî her ku diçe bêhtir roleke neteweyî digêre û di navenda civak û siyasetê de dadiçike. Ji ber vê di kovar û rojnameyên pêşî yên kurdan de helbestvanên kurd erkê neteweyî yê helbestê dupat dikin û ji mijarên takekesî û evînî zêdetir berê helbestê didin mijarên civakî û siyasî. Bi taybetî piştî Cenga Cîhanê ya Yekem bi çirûsîna îhtîmala serxwebûna kurdan hin helbestên ku di kovara *Jînê* de tên weşandin wek zimanhalên vê serdemê wateyeke siyasî û neteweyî didin helbestê. Bo nimûne Qazî Letîf di helbesteke xwe de her bi şêweyê Hacî diyar dike ku helbestvanên kurd divê êdî bes behsa zulfê yarê bikin û pêwîst e ji vir û pê de behsa tiştekî weha bikin ku kurdan pê bînin kar û bikevin tevgerê.

Şairî kurdan, meken behsî uzar û zulfî yar
Behsî behsêkî biken, bo kurd lemew paş bête kar (Qazî Letîf, 1985: 380).

Di serdema şoreşa Şêx Mehmûd de jî di rojnameyên wê serdemê de helbestên bi vî awayî tên weşandin. Bo nimûne di helbesteke hevbeş a M. Nûrî û Elî Kemal de tê diyarkirin ku helbestvanên kurd divê êdî bes terîfa xet û çavên yarê bikin û ji bo bidestxistina mûçeyek yan berjewendiyekê helbestan binivîsîn. Bi dîtina wan erkê helbestvan divê rênîşandan be ji bo pêşketin û serfiraziya neteweyê.

Besyetî ey şaîran te'rîfî xet û çahî zeqen
Besye ey memur, îtir basî miaşim bo meken
Bo weten bo dîn û mîllet bên nesîhet da biden
Bo tereqî mîllet ême ba biken serfî beden (Nesrîn Reûf Îsmaîl, 2010: 114).

Ehmed Muxtar Caf wek şahidê serdema şoreşa Şêx Mehmûd, behskirina mijarên evînî û takekesî herwek pejirandina bindestiya kurdan dibîne û ji helbestvanên kurd dixwaze bes behsa zulf û çav û perçem û kakulên yarê bikin û divê ji bo qewmê xwe yê dilşewitî li çareyekê bigerin. Bi dîtina wî eger helbestvanên kurd li ser terîfa mey û piyale û gul û sehbayê û rêveçûn û bejna yarê berdewam bin dê negihîjin tu derekê. Lewra Ehmed Muxtar helbesta kevin bi serxweşiyê tawanbar dike û helbesta nû ya neteweyî jî wek serbestiyê nîşan dide û ji nav van her duyan dixwaze helbestvanê kurd yekî hilbêjere ku bi dîtina wî ew jî serbestî ye. Lewra bi dîtina wî helbesta serxweşiyê pûç û bê wate ye û tu sûda wê nîne.

**Şa'îranî kurd bes e bes basî zullf û çaw biken**
**Kem xeyallî perçem û kakollî alozaw biken**
**Labiden kem basî sunbul ya liqî lawlaw biken**
**Êwe tedbîrêkî hallî qewmî dillsûtaw biken**
**Zûbezû ta îş le des derneçuwe sa hewllî biden**

**Êwe te'rîfî mey û piyalle û gull û sehba eken**
**Daîma her basî lence û qametî re'na eken**
**Serxoşî xoş e, weya serbestî? Bo çî wa eken**
**Taku key êwe qisey wa pûç û bê me'na eken**
**Zûbezû ta îş le des derneçuwe sa hewllî biden (Ehmed Muxtar Caf, 1986: 106)**

Şêx Nûrî Şêx Salih di wê baweriyê de ye ku divê helbestvan bi hişmendî serîderî digel jiyanê bike, ji bo nexweşiyên jiyanê bigirî, ji bo xweşiyan dilşad be, lê divê ev girîn xwe bispêre hizrekê. Bi dîtina wî divê helbestvan wek kamerayekê çavdêriya jiyanê bike û ji başî û xirabî, tehlî û şîrîniyên welat her çi bibîne divê bîne ser ziman û wan di çarçoveya helbestên estetîk de bihone. Helbestên bi vî awayî ji ber ku sûda wan ji bo gel heye divê bên çapkirin û jiberkirin. Bi dîtina wî helbestvan divê şîn û şahiya welat di çarçoveya helbestên "rêk û rewan" de bihone û pêşkêşî raya giştî ya neteweyî û cîhanê bike, da ku helbest xizmeta hişyariya gel û bihêzkirina doza neteweyî bike. Bi vî awayî Şêx Nûrî di navbera hizrên niştimanî û hunera helbestê de hevahengiyekê çê dike û helbestê wek hilgirê xem û şahiyên neteweyê pênase dike ku dikare hem di nav welat de hem jî li derveyê welat bibe zimanhalê neteweyekê.

**Le nizîk bê, ya le dûr bê**
**Şa'îr ebê, başi'ûr bê**
**Be naxoşî giryanî bê**
**Be xoşî şad û mesrûr bê**
**Bellam giryanî em şî're**
**Kurrûzanewey be fîkr e**
**Be aşkira ya be dizî**
**Çak û xirapî herçî dî**
**Wek kamera eygirê zû**
**Çapî eka û eyxate rrû**
**Tall û şîrîn herçî noşî**
**Xoşî bînî, ya naxoşî**
**Ebê bête ser zubanî**
**Bîxate çwarçêwey ciwanî**
**Be şî'rî xoş û rrewanî**
**Kameranî, perêşanî**
**Hall û wez'î nîştimanî**
**Heta heta, heta manî**
**Billê û bîka be şî'rî ciwan**
**Bê mandû bûn, be bêwiçan**
**Em şî'rane le çap edrê**
**Le çap edrê, le ber ekrê**
**Be dîmenî xoş û naxoş**
**Pêkenîn û giryanyan bê**
**Em giryan û pêkenîne**
**Em şayîye, ya em şîne**
**Be hellbestî rêk û rewan**
**Bîxene ber çawî cîhan**
**Eme hallî şa'îran bê**
**Kirdewey xwêndewaran bê (Şêx Nûrî Şêx Salih, 2008: 459-460)**

Qani‘ edebiyatê wek hezkirina welat û xizmetkirina neteweyê dibîne. Bi dîtina wî helbest wek xişrê bûka welat e û erkê wê xemilandin û pesindana wê ye, loma jî herçend mirovên nezan û bêeqil tênegihijîn jî helbest ji vî aliyî ve wek durên giranbuha xwedan qîmet in. Qani‘ weha diyar dike ku divê nûka qelema helbestvan ji bo wesifdana welatparêzan kar bike, ne ku ji bo pesindana şahê Qaçar yan jî hakimên tirkan. Lewra helbestvanê welatperwer ji bo pere kar nake, belkî daxwaza wî bilindkirina gel e. Loma jî bi helbestên xwe derdê dilê birîndar ê endamên neteweya xwe derman dike ku dijmin di kuçe û bazarên wan de hatûçûyê dikin. Qani‘ jî her wekî Hacî ji kurdan dixwaze ku guh bidinê, lewra helbestên wî yên neteweyî behsa av û zozanên welat, qenciya tifaq û hevkariyê, girîngiya xebat û xwendinê, nasîna nîjada bav û kalan û geşkirina hizrên neteweyî dikin.

**Şa‘îr bo pare hîç naka pele**
**Arezûy şa‘îr her berzî gel e (Qani‘, 1391: 27)**
**Şî‘rî min dermanî derd e bo dilley zamarî to**
**Seyrî duşmin ke le şar û kuçe û bazarî to (Qani‘, 1391: 217)**
**Hubbî weten û xizmetî xelk e edebiyat**
**Daxil be sef û defterî ta‘at e edîbî**
**Bo bûkî weten xişll e yeqîn şî‘rî edîban**
**Layek be sena û medih û miqamat e edîbî**
**Bo ehlî huner durrî giran mayey mehz e**
**Lay bê huner û ‘eqll xerafat e edîbî (Qani‘, 1391: 302-303)**
**Heta nûkî qellem kar ka le ewsafî wetenxwan**
**Le te’rîf şahî Qacar û le hukmî turk û tarim çî (Qani‘, 1391: 312)**
**Le we‘z û mew‘îze û eş‘arî mîllî**
**Le te’rîfî willat û aw û kwêstan**
**Le fezlî gewreyî û rresmî biçûkî**
**Le te’lîmî minall û ehlî ‘îrfan**
**Le çakî îttîfaq û komekî yek**
**Le hellgirtin çek û wêstanî meydan**
**Le basî kasibî û te’lîmî nûsîn**
**Le nasînî nijadî dak û baban**
**Le koşiş kirdinî, efkarî mîllet**
**Le ewza‘î melayî û basî şêxan**
**Min im Qani‘ be tenya û be bêkes**
**Xwa hellsin le xew lawanî nîştiman (Qani‘, 1391: 188)**

Esîrî herwekî helbestvanên beriya xwe replîka dijayetiya eşqa zulf û kakulan dubare dike û diyar dike ku di şûna wê de divê eşqa nîştiman cihê xwe bigire ku mejiyê mirov bi nûra xwe ronî dike. Esîrî diyar dike ku wî, vîna xwe di rêya eşqa milet de ji dest daye û bi awayekî bêperwa gotinên ji xwe mezintir dike (Esîrî, 2006: 44). Helbestvan di helbesta “Pêxwazî Çaxî” de poetîkaya helbesta xwe aşkeratir dike û ji helbestvanan dixwaze ku ji bo serkeftina kurdan dest ji helbestên eşqbaziyê berdin û di şûna van cure helbestan de ji bo çêkirina hişmendî û hişyariyê helbestên dîrokî binivîsin. Esîrî Homeros wek danerê helbesta dîrokî dide zanîn ku bi saya vê rêbaza xwe ya edebî çend hezar sal in di nav yûnanan de navê wî zindî maye. Helbestvan behskirina çav û xal û xetên yarê wek rewişt xirabî pênase dike û ji helbestvanên din dixwaze ku eger wîjdana wan hebe divê xwe ji helbestên weha dûr bigirin.

**Ger edîbî, arezûy serkewtinî kurdit heye**
**Terkî bêjî ‘îşqbazî ke, eger bîrit heye**
**Bêjî te’rîxî billê bo agedarî mîlletit**
**Peyrewî zanîn û kirdarî be, ger hoşit heye**
**Nawî Homer çend hezar sall e le yonan her heye**
**Bêjî te’rîxî degut, wek ew be, ger zewqit heye**
**Guftî bed exlaqî û nawî edebî çon ebê**
**Terkî guftî çaw û xall û xet ke, wîcdanit heye**
**Terkî kurdî û nezmî turkî û farsî çon mirwet e?**
**Xot mebe bêfer ekey binware ger bîrit heye (Esîrî, 2006: 225)**

Zêwer wek helbestvanekî neteweperwer di wê baweriyê de ye ku divê helbest ji bo xizmeta milet bê nivîsîn û helbestvan jî di çarçoveya vê hizrê de kar bike. Li gor ragihandina Refîq Hîlmî dema ku dest bi nivîsîna helbestan dike, helbestên xwe ji Zêwer re dişîne, da ku kêmasiyên wî rast bike. Di vê çarçoveyê de Hîlmî carekê xezeleke xwe ya aşiqane jê re dişîne û li ser heman kêş û qafiyeyê Zêwer bi helbestekê bersiva wî dide û diyar dike ku xwe bi helbestên “zulf û xet û xal”ê gîro neke û berê xwe bide helbestên nîştimanî. Bi vî awayî em li ser zimanê Hîlmî hîn dibin ku Zêwer jî bi awayekî hişmendane bûye yek ji danerên poetîkaya helbesta neteweyî ya kurdî ku ev malik îspata wê ne:

**Ey Refîqî muhterem ey şa‘îrî şîrîn meqall**
**Hate ber meddî nezer fîkret weku awî zulall**
**Min umêdî gewre gewrem pêt e bo em mîllete**
**Heyf e serfî fîkrî xot key to le zulf û xet û xall (Refîq Hîlmî, 2010: 145).**

Cegerxwîn li ser rêça helbestvanên kurd ên berî xwe helbestê di navenda kar û armancên neteweyî de datîne. Bi dîtina wî, ji ber ku helbestvanên berê, xwe mijûlî “biskên şê” kirine, nekarîne rêberiya gelê xwe bikin (Cigerxwîn, 1992: 30) û ji derdê wan re bibin derman. Di poetîkaya Cegerxwîn de helbestvan rêber e, helbest ayetên pîroz in û netewetî jî dîn e. Dema dibêje “Peyvê Cegerxwîn ayetê kurd in” (Cigerxwîn, 1992: 338), “Cegerxwîn gerçi seydayê kurd e”, “Wezîfey xom her teblîxî kurd e” (Cigerxwîn, 1992: 33),“Tu ola xwe deyne welatperwerî / Xwedî ristevan û xwedî rêberî” (Cigerxwîn, 1997: 131) yan jî “Ez ê oleke pir ciwan çê bikim” (Cigerxwîn, 1992: 72) vê bi aweyekî aşkera berçav dike. Cegerxwîn helbesta neteweyî di xizmeta gel de dizane û wek helbestvanên berê bi armanca bidestxistina berjewendiyeke şexsî pesindana kesekî hêjayî helbestvanên neteweyî nabîne (Cigerxwîn, 1992: 33), loma jî helbesta xwe wek qîrîneke pênase dike û ji kurdan dixwaze ku guh bidine vê qîrînê (Cigerxwîn, 1992: 42).

Qedrî Can di helbesta xwe ya “Niştiman Birîndar e”yê de poetîkaya helbesta neteweyî berçav dike. Bi dîtina wî ji ber ku di rêya nîştiman de li ber çavê gelê kurd sêdare hatine danîn, divê helbest dest ji efsaneyên berê û mijarên meyxaneyê berde. Loma jî ji Pîremêrdê saldîde re dibêje zêde derdan mexwe û ji keça delal a Çemçemalê re jî dibêje menale, lewra bi dîtina wî ne dem dema bêhêvitiyê ye ne jî dema şîngirtinê ye. Qedrî Can jî herwekî Hacî di mînaka Naliyê nûnerê helbesta aşiqane de diyar dike ku divê helbestvan xwe ji bo maçeke şeydayî û qurbankirina yarê erzan neke, lewra erkê helbestê di vê serdemê de handana têkoşîn û xebatê ye û hilgirtina berpirsiyariya civakî û siyasî ye.

**Niştiman birîndar e, wextî efsane niye**
**Li ber çavan sêdar e, wextî bêgane niye**
**Ey cenabê Pîremerd, saldîdeyî germ û serd**
**Bo çi tu pir ekî derd, wextî meyxane niye**
**Ey kiça li Çemçemal, kiça kurd, kiça delal**
**Li hed ziyade tu menal, wextî giryane niye**
**Ey Nalî dîwanî, bo maçêk şeydanî**
**Tu xud ekî herzanî, wextî qurbane niye**
**Niştiman birîndar e, li ber çavan sêdar e**
**Wextê eşqane niye, wextê mestane niye. (Qedrî Can, 2009: 116)**

Di poetîkaya Hêmin de helbestvan ew kes e ku ji bo gel xwe mîna findê dişewitîne û bi şewata xwe gel ronak dike (Hêmin, 2708: 177). Ji ber ku helbestvan êş û azara gel di dilê xwe de hildigire jiyana xweş ji bo wî mehal e (Hêmin, 2708: 158). Navborî di helbesta xwe ya “Perî Şî‘r”ê de hemû taybetmendiyên helbesta neteweyî ya şoreşger berçav dike. Li gor wî helbest sirûda şadiyê, dengê azadiyê, mizgîna rizgariyê, şevçiraya qada xebatê, agir û çirûska çeperê, teyîsîna xencerê, ronahiya guleya êrîşê û hişyarkerê xewaran e. Ji ber vê jî ev helbest ziravê dijmin diqetîne, deriyê zindanan vedike û hemû bende û dîlan azad dike. Helbestvan ji ber ku helbestê wek şêweyekî têkoşînê dibîne diyar dike ku periya helbesteke weha, wek keçeke xweşik nayê jivana zilamekî pîr, lewra helbestvanê neteweyî yê şoreşger divê xort be, da ku bikare di meydana cengê de têbikoşe.

**Şî'rêk sirûdî şadî bê**
**Şî'rêk dengî azadî bê**
**Şî'rêk mizgînî necat bê**
**Şewçeley gorrî xebat bê**
**Şî'rêk req bê, riq bê, qîn bê**
**Girr bê, billêse bê, tîn bê**
**Şî'rêk sengçinî senger bê**
**Şî'rêk birîqey xencer bê**
**Hêzêk bê dujmin bezên bê**
**Mistêk bê gurç û tezên bê**
**Billêsey gulley hellmet bê**
**Şepolî riqî mîllet bê**
**Şî'rêk nûstû raperrênê**
**Şî'rêk dujmin daperrênê**
**Bişkênê derkî Bastîlan**
**Azad bika koyle û dîlan (Hêmin, 2708: 2004)**

Herçend yekem car manîfestoya poetîkaya helbesta neteweyî ji aliyê helbestvanan ve hatibe diyarkirin jî, piştî demekê rexnegir jî di vî karî de beşdarî dikin û ji bo nivîsîna helbestên neteweyî helbestvanên kurd han didin. Siyahpoş (Îbrahîm Ehmed) wek rexnegirekî vê serdemê diyar dike ku di serdema modern de guherînên mezin çê bûne û her di çarçoveya van guherînan de divê helbest jî erk û armancên nû bide ber xwe û di xebat û têkoşîna neteweyî û guherînên siyasî û komelayetî de beşdarî bike. Bi dîtina nivîskar, helbest tercumanê dil e û hemû hestên mirov bi awayekî dilgirane derdixe holê, ji ber vê jî helbest ji bo têkoşeran di rêya jiyanê de çiraya hêviyê pêdixe, digel pencên asinîn ên gerdûnê destbazî dike, daxwaza azadî û welatperestiyê geş dike û di vedîtina heqîqetê de arîkariya mirov dike (Birayîm Ehmed, 2007: 7-8; Kamil Hisn Ezîz Yesîr, 1990: 130). Nivîskar ji ber ku piraniya helbestvanên kurd wek dildarên xweperest û bê perwa, mijûlî "çavên kal û lêvên al" dibîne rexne li wan digire û ji wan dixwaze ku li tenişt wesfê ciwaniya yarê behsa ciwaniya siruşta Kurdistanê jî bikin (Nesrîn Reûf Îsmaîl, 2010: 94-95). Bi vî awayî ji hemû aliyan ve dixwaze helbest bibe hilgirê peyama neteweyî û erkekî neteweyî û nîştimanî dide ser milên helbestê û helbestvanan.

Di kovara *Gelawêj*ê de jî çendîn rexneyên bi vî awayî hatine weşandin ku yek ji wan nivîsa "Nameyek bo Edîbekanman" a Q. Neberd e. Bi dîtina Neberd di warê estetîka edebiyatê de du rêçik hene: Li gor rêçika yekemîn armanca edebiyatê tenê teknîk û nivîsîneke ciwan û bêkêmasî ye, loma jî edîbên peyrewên vê rêbazê xwe ji civakê dûr digirin û bi tu awayî di tevger û armancên gel de beşdarî nakin. Nivîskar rexne li van edîban digire ku heta niha jî nekarîne dijminê rastî yê gel bibînin û bi rêya helbestên xwe rûbirûyê wan bibin. Bi dîtina wî çawa ku jiyan kartêkirineke temam dixe ser edebiyatê, edebiyat jî pêwîst e kartêkirineke weha li ser jiyana gel çê bike û berê wan bide ser rêya rast. Loma jî nabe ku edîb her ji bo edebiyatê yan ji bo çend kesekî taybet binivîse, divê ji bo milet binivîse. Neberd diyar dike ku edebiyata bê arastekirin wek edebiyat nayê jimartin, ji ber vê pêwîst e her edîbekî rast, berî ku dest bi nivîsînê bike, armancekê destnîşan bike û ji bo pêkanîna wê xebat bike û edebiyatê bike çirayek ji bo wan kesên ku naxwazin di wê riyê de biçin (Nesrîn Reûf Îsmaîl, 2010: 103-105).

Herwekî di boçûnên van helbestvanên navborî û rexnegiran de jî tê dîtin poetîkaya helbesta neteweyî yekem car li ser redkirina mijarên takekesî û evînî tê avakirin û ji estetîkeke çêjbexş zêdetir, li ser bingeha helbestên watedar tê avakirin ku naveroka wê bi berjewendiyên gel û nîştiman hatiye dagirtin. Ji Hacî heta Dildar gelek helbestvan diyar dikin ku "zemanî şi'rî bê me'na nema"ye (Dildar, 1985: 178). Ev nîşan dide ku estetîka helbesta neteweyî ya kurdî, ne li pey çêjbexşîna bêwate ye, belkî çêjeke watedar ji xwe re dike armanc û di vê çarçoveyê de li dijî estetîka Kant wek şopgerê estetîka Hegel derdikeve pêş. Ji ber vê helbesta neteweyî ya kurdî xwe dispêre hevgirtina civakî û siyasî û li ser rewiştekî bilind ê neteweyî xwe ava dike. Helbestvanên kurd ji bo nîşandana rewiştparêziya xwe ya neteweyî hertim diyar dikin ku helbestên wan di bin xizmeta berjewendiya gel de ne û ew bixwe ji bo berjewendiya şexsî pesnê tu kesekî nadin. Bi vî awayî hem mijareke helbesta klasîk red dikin hem jî rewiştîbûna helbesta neteweyî dupat dikin. Di vê rewşê de helbest dibe wek manîfestoyeke neteweyî û helbestvan jî dibin rêber û cîbicîkarên vê manîfestoyê. Ji ber vê jî herwekî ku li jor jî hat nîşandan helbestvan ji gel dixwazin ku guh bidin wan, piştgirî nedin pêşengên civaka nerîtî û ji bo armancên neteweyî kar bikin. Rexnegir jî di çarçoveya rêbaza huner bo civakê de ji helbestvanan dixwazin ku peyamdar bin û berhemên xwe bixin bin xizmet û berjewendiya gel.

## 5. Encam

1. Estetîk di berhemên edebî de li gor teoriyên cuda di çarçoveya form, naverok û binyada berhemên edebî de tê nirxandin, ji ber vê jî çendîn pênaseyên wê yên ciyawaz û dijber hene.
2. Helbestên neteweyî ji ber ku li ser hizra hevgirtina civakî û siyasî ya îdeolojiya neteweyî tê danîn û ji forma xwe zêdetir bi naveroka xwe derdikeve pêş di çarçoveya hizrên estetîkî yên Hegel de dikare bê nirxandin.
3. Bingehên estetîka Hegel vedigere ser boçûnên rexnegirên pêşî yên yûnanî û romanî û xwedan reheke bihêz e di dîroka rexneya edebî de. Ev rexne û berhemên ku li gor vê têgihîştinê hatine nivîsîn bi taybetî di wan serdeman de derdikevin pêş ku cîhan di çarçoveya îdeolojiyeke yekgirtî û giştgîr de hatiye pênasekirin.
4. Helbest di nav cureyên din ên edebî de ji ber dîroka xwe ya dûrûdirêj, têkelkirina hest û hizran û ji ber regezên xwe yên muzîkal û rîtmîk cureya herî neteweyî ya edebiyatê ye û ji bo bihêzkirin û belavkirina netewetiyê zemîneke gelek berhemdar e.
5. Helbestvanên kurd ên neteweperwer di serdema modern de naveroka helbesta nû bi netewetiya kurdî dadigirin û helbestê dikin zemîna hişyarkirina gel û pêşvebirina welat. Loma jî poetîkaya helbesta neteweyî ya kurdî li ser bingeha estetîka Hegel tê avakirin û ciwaniya helbestê di naveroka wê ya neteweyî tê dîtin.

### ÇAVKANÎ


**A- BI ZIMANÊ KURDÎ**

1. Amêdî, E.Y. (2005). *Honrewey Bergirî Le Berhemî Çend Şaîrêkî Kurmancî Serû da (1939-1970)*. Hewler: Çapxaney Wezaretî Perwerde.
2. Bressler, C. (2002). *Rexney Edebî û Qutabxanekanî* (Ebdulxaliq Ye'kûbî, Wer.). Hewlêr: Aras.
3. Caf, E. M. (1986). *Dîwanî Ehmed Muxtar Caf* (Amadekirdin û Berawirdkirdin û Pêşekî bo Nûsînî: Îzedîn Mistefa Resûl). Bexda: Çapxaney Eledîb.
4. Cigerxwîn (1992). *Dîwana Yekan – Sewra Azadî*. İstanbul: Weşanxana Deng.
5. Cigerxwîn (1997). *Zend-Avista – Şefeq* (Çapa Duyemîn). İstanbul: Weşanxana Deng.
6. Dildar (1985). *Dildar Şaî'rî Şorişgêrî Kurd* (Amadekar: Ebdulxaliq Elaedîn Darul Afaq Erbiyetu Sehafetu wen neşir). Bexdad.
7. Ehmed, B. (2007). *Koy Berheme Şî'rîyekanî*, Kokirdnewe û Saxkirdnewe û Pêşkeşî: Umer Meruf Berzincî, Nawendî Çapemenî û Rageyandinî Xak, Çapî Yekem, Silêmanî.
8. Esîrî (2006). *Dîwanî Esîrî* (Çapî Yekem) (Amadekirdin û Pêşekî: Kurdistan Mukriyanî). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras.
9. Hêmin (2008). *Dîwanî Hêmin Sercem Şî'rekanî Mamosta Hêmin*. Silêmanî: Pexşangay Azadî.
10. Hîlmî, R. (2010). *Şî'r û Edebiyatî Kurdî* (Çapî Duwem). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras.
11. Îsmaîl, N. R. (2010). *Erkî Şî'r le Edebî Kurdî da*. Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.

12. Koyî, H. Q. (2007). *Dîwan* (Lêkolînewe û Lêkdanewey S. Hemîd, M. Kerîm, M. Şareza). Sine: Şarekitêbî Mîdya.
13. Letîf, Q. (1985) "Xezel", *Jîn* j. 7, (c. 2., r. 380) (Amadekar: M. E. Bozarslan). Uppsala: Weşanxana Deng.
14. Plîxanof (2005). *Huner û Jiyanî Komelayetî* (Çapî Yekem) (H. K. Arif, Wer.). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Mukriyan.
15. Qani' (1391). *Dîwanî Qani'* (Çapî Hewtem) (Kokirdnewey: Burhan Qani'). Tihran: Çapxaney Dallahu.
16. Qedrî Can. (2009). *Hemû Berhemên Wî* (Çapa Yekem ) (Amadekar: Rênas Jiyan) Stenbol: Belkî.
17. Şêx Nûrî Şêx Salih (2008). *Dîwanî Şêx Nûrî Şêx Salih* (Çapî Duwem) (Kokirdnewe û Saxkirdnewe: Azad Ebdulwahîd). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras.
18. Yesîr, K. H. E. (1990). *Wêjey Kurdî û Rexnesazî*, Çapxaney Darul Cahiz.
19. Xanî, E. (2005). *Mem û Zîn* (Çapa Diduyan) (Wergêrê Tîpên Latînî û Kurdiya Xwerû: M. Emîn Bozarslan). Stenbol: Weşanên Deng.
20. Zêwer (2008). *Dîwanî Zêwer* (Çapî Duwem) (Amadekar: Mehmûd Zêwer). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras.

**B- BI ZIMANÊ TIRKÎ**

1. Anderson, B. (2011). *Hayali Cemaatler Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması* (Çapa Şeşem) (İ. Savaşır, Wer.). İstanbul: Metis Yayınları.
2. Aristoteles (2014). *Poetika Şiir Sanatı Üstüne* (Çapa Yazdehem) (S. Fırat, Wer.). İstanbul: Can Sanat Yayınları.
3. Brandist, C. (2011). *Bahtin ve Çevresi* (Cem Soydemir, Wer.). Ankara: Doğu Batı Yayınları.
4. Caudwell, C. (1988). *Yanılsama ve Gerçeklik (Illusion and Reality)* (Çapa Duyem) ( M. H. Doğan, Wer.). İstanbul: Payel Yayınevi.
5. Eagleton, T. (2011). *Şiir Nasıl Okunur* (Çapa Yekem) (K. Genç, Wer.). İstanbul: Agora Kitaplığı.
6. Eliot, T.S. (2007). *Edebiyat Üzerine Düşünceler* (Çapa Yekem) (S. Kantarcıoğlu, Wer.). İstanbul: Paradigma Yayıncılık.
7. Eriksen, Thomas Hylland (2002). *Etnisite ve Milliyetçilik* (E. Uşaklı, Wer.). İstanbul: Avesta.
8. Ewald, O. (2013). *Fransız Aydınlanma Felsefesi* (Çapa Duyem ) (Gürsel Aytaç, Wer.). Ankara: Doğubatı Yayınları.
9. Felski, R. (2010). *Edebiyat Ne İşe Yarar?* (E. Ayhan, Wer.) (Çapa Yekem). İstanbul: Metis Yayınları.
10. Flaccus, Q. H. (2012) *Ars Poetika Şiir Sanat* (E. Özbayoğlu, Wer.). İstanbul: Arkeoloji ve Sanat Yayınları.
11. Hegel, G. W. F. (1994). *Estetik I: Güzel Sanat Üzerine Dersler* (Çapa Yekem ) (T. Altuğ & H. Hünler, Wer.). İstanbul: Payel Yayınevi.
12. Herder, J. G. (2006). "İnsanlık Tarihi Felsefesi Üzerine Düşünceler", *Tarih Felsefesi Seçme Metinler* (r. 23-29 ) (Amadekar: D. Özlem & G. Ateşoğlu). Ankara: Doğu Batı Yayınları.
13. Jusdanis, G. (1998). *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür Milli Edebiyatın İcat Edilişi*, (Çapa Yekemîn ) (Tuncay Birkan, Wer.). İstanbul: Metis Yayınları.
14. Karatani, K. (2011). *Derinliğin Keşfi Modern Japon Edebiyatının Kökenleri* (Çapa Yekem) (D. Ç. Güven &İ. Öner, Wer.). İstanbul: Metis Yayınları.
15. Kantarcıoğlu, S. (2009). *Edebiyat Akımları Platon'dan Derrida'ya*. İstanbul: Paradigma Yayıncılık.
16. Köroğlu, E. (2004). *Türk Edebiyatı ve Birinci Dünya Savaşı (1914-1918) Propagandadan Milli Kimlik İnşasına* (Çapa Yekem). İstanbul: İletişim Yayınları.
17. Lukacs, G. (2011). *Roman Kuramı* (Çapa Sêyem) (C. Soydemir, Wer.) İstanbul: Metis Yayınları.
18. Nietzsche, F. (2011). *Şen Bilim* (Çapa Sêyem) (A. İnam, Wer.). İstanbul: Say Yayınları.
19. Ökten, K. H. (2006). "Siyasal Tarih ile Felsefenin Kesişim Noktası: Fichte'nin Alman Ulusuna Söylevleri", *Alman İdealizmi: I*, (Amadekar: Eyüp Ali Kılıçaslan-Güçlü Ateşoğlu). Ankara: Doğu Batı Yayınları.
20. Plehanov, G. V. (1999). *Toplum, Sanat, Eleştiri* (Çapa yekem) (A. Bezirci, Wer.). İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
21. Pospelov, G. (2014). *Edebiyat Bilimi* (Çapa Sêyem) (Yılmaz Onay, Wer.). İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
22. Rousseau, J. J. (2009). *Melodi ve Müziksel Taklit ile İlişki İçinde Dillerin Kökeni Üstüne Deneme (*Çapa Duyem) (Ö. Albayrak, Wer.). İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları.
23. Rousseau, J. J. (2011). *Bilimler ve Sanatlar Üstüne Söylev* (Çapa Sêyem) (S. Eyüboğlu, Wer.). İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları.
24. Todorov, T. (2012). *Fantastik* (Çapa Duyem ) (N. Öztokat, Wer.). İstanbul: Metis Eleştiri.
25. Sartre, J. P. (2011). *Edebiyat Nedir?* (Çapa Çarem) (B. Onaran, Wer.). İstanbul: Can Sanat Yayınları.
26. Simith, A. D. (2012). "Milletin Savunusu", *Milletler ve Milliyetçilikler* (r. 69-82) (Der: Mümtaz'er Türköne). İstanbul: Etkileşim Yayınları.
27. Zima, P. V. (2006). *Modern Edebiyat Teorilerinin Felsefesi* (Çapa Duyem). Ankara: Hece.
28. Ziss, A. (1984). *Estetik* (Y. Şahan, Wer.). İstanbul: De Yayınevi.

## Aesthetics in The Nationalistic Poems

**ABSTRACT**

The term of aesthetics in literary works has been argued within the frame of form, content and structure, and identified in various ways. Nationalistic poems, as they are built on social and political unity of the national ideology and come to the forefront for their contents rather than their forms, can be evaluated within the scope of Hegel's aesthetics. Because poetry, as the most nationalistic form, constitutes a very productive ground for strengthening and disseminating nationalism, Kurdish poets renovate Kurdish poetry with a nationalistic content in the modern era and they transform poetry into a suitable ground for awakening of the nation and development of the homeland. This shows that patriotic Kurdish poets built poetics of poetry on Hegel's aesthetics and experience aesthetics of poetry in nationalistic content.

**Keywords:** Aesthetics, kurdish poem, nationalistic poems.